



Mam Celal..

**Vegera te çavê Kurdistanê kil kir..
Dilê te Kurdistan e**



Durûtiya Zimankaran



Qado Şêrin

Wexta me di 01/12/2013an dest bi çalakîya Pêncşema Ziman a ji bo xwendin û nivîsandina bi kurdî di facebookê de kir,

me texmîn dikir ku wê nivîskar, helbestvan û zimanzanên kurd berî nişên din xwedî lê derkevin, ango yên têkiliyan wan bi ziman re heye û bi ziman re kar dikin. Em zêde geşşin bûn. Nivîskar û helbestvanên ku pirtûkan bi kurdî çap dikin, bi berdewamî gazin kirine û gotine berhemên wan nayên xwendin, çimkî

kurd nizanin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Bihaneya wan jî tim ew bû ku di jinan ziman qedexe kirine. Ji ber wê bêtir ji wan dihat xwestin xwedî li çalakîyê derkevin, bibin nimûne di şêrînkirina xwendin û nivîsandina kurdî, lê mixabin ew yek nekirin, bêtir xelkê digotin: Nivîskar û rewşenbîrên me bi kurdî nanivîsin, êdî em ê çima xwe fêr bikin û binivîsin, ta ku me çalakî rawestand.

Mirovê pirtûka bi kurdî çap dike, ji her kesî bêtir jê tê xwestin ku xelkê li xwendin û nivîsandina bi kurdî sor bike, daku pirtûkên wî belê xwendin, û ziman jî di wexta globalîzmê de ji êrîşên zimanên qerase bê parastin.

Herwiha partî, dezgeh û rêxistinên kurdan jî xwedî li çalakîyê derneketin, wek ku ne ji bo zimanê

wan bû. Çimkî ne ew pê rabibûn û ne bi navê wan bû.

Dezgehên çandî û rewşenbîrî jî yên ku qaşo ji bo ziman kar dikin, xwedî li çalakîyê derneketin û piştta wê negirtin. Tenê Hevbenda Nivîskar û Rojnamevananên Kurd li Sûri xwestin piştta çalakîyê bigrin û xwedî lê derkevin, lê min nehişt, çimkî wê piştgiriya wan ji bo kesê min ba, eger ez ne endamê wan bama, wê wan jî piştta wê negirtiba.

Wiha diyar e ku kurd pirs-girêkên xwe yên sereke û cewherî bi kesayetiya mirovan ve girê didin, bê ku naveroka pirojeyên wan mirovan binixînin û lêkolîn bikin, belkî ji ber wê gelek caran rasti têkçûn û şikestinan tên. Hinan jî bo kesayetiya me bi kurdî nedivîsandin, xwedî li çalakîyê derneketin, wek ku

ziman samanê dê û bavê me be. Digotîna ne hûn in ên bi vê çalakîyê rabin, me jî ji wan re digot: Nexwar û neda hevala, genî kir avête newala. Ne dikin û ne jî dihêlin mirov bike. Di dîv re hate naskirin ku ya wan kîn û zikreşî bû. Ji xwe di dîv re xwe êşkere derbirin û gotin: Ma Qado Şêrin kî ye me mecbûrî xwendin û nivîsandina bi kurdî bike? Li gel ku min tim hewl dida xwe ne wek xwediyê çalakîyê diyar bikim, bêtir wek çalakovanekî nenas ji nav birêvebirên P.Z, ji ber wê me her tişt bi navê rûpela P.Z dikir. Siyasetvanên kurd ên ku bi dehên salan e qaşo ji bo mafên kurdan xebatê dikin, ne xwe fêrî xwendin û nivîsandina bi kurdî kirine, belê diyar bû ku ne bi pilan in xwe fêrî jî bikin, bêtir diyar bû ku ziman ne di bernameya wan de

ye, çimkî ne di roja çalakîyê de û ne jî di rojên din de bi kurdî nanivîsin û nedivîsandin. Durûtiya wan zikê xelkê têşand. Hin nivîskar û helbestvanan gilî û gazin dikirin û digotin: Çima tenê rojek ji bo ziman, gerek her roj bi kurdî bê nivîsandin, lê weleh û bileh û tileh wan bi kurdî nedivîsandin û heft rojan toz bi erebî radikirin. Gelek nivîskar, rojnamevan û siyasetmedarên kurd dostaniya rûpela P.Z ta ku piştî şaş mehan rawestiya ji nepejirandin, belkî ji bo ku nekevin bin ferman û şermezariya P.Z û bi kurdî nenivîsin. Yên herî bêtir di roja çalakîyê de bi kurdî nedivîsandin, nivîskar û rewşenbîrên kurd bûn (navên wan tomar kirî ne). Bi giştî wek me li jor nivîsand, reşbîniyê deriyê çalakîyê girt û bû

egera rawestandî, lê disa jî hinan mîna Tengezêrê Marîni, Konê Reş û Boniye Cigerxwîn û hin din bi xurtî alîkar bûn û ji min bêtir xwedî li P.Z derdiketin. Li dawî, wê çalakî nerawesta eger zana, zikêşên ziman, nivîskar û siyasetvanên kurd xwedî li zimanê xwe bi riya çalakîyê derketina, çimkî ziman zimanê me hemûyan e û ji erkê me hemûyan e xwedî lê derkevin û xelkên xwe li xwendin û nivîsandina bi kurdî sor bikin. Me bi riya çalakîyê nas kir ku em kurd bêtir ji ziman hewcedarî hevdu qebûlkirinê ne, jîhevhezîkirin û li hev guhdarîkirinê ne. Di dîv re em ê karibin bêjin: Çilo dayikên xelkê nabin dayikên mirov, wiha jî zimanê xelkê nabin zimanê mirov, êdî xwe bi zimanê xwe, ne bi yê xelkê rep bikin.

Pênûsa Reben Nav Tiliyan de Dilhayî Maye Peyv "Sirûş" e, ne "şirûs" e



Berzo Mehmûd

Tevgera nivîsînê bi zimanê Kurdî karekî hêja û pîroz e, û pêwîst e mirovên kurdperwer û rewşenbîr vebatê di vê cökê de geş bikin û xurt bikin, ji ber ku zimanê me îro roj bûye nasnameya me ya netewî ku me ji netewên ditir cuda dike û hebûna me wek netewe destnîşan dike. Lewre, guhdan û ferekirina zimanê Kurdî pêwîstî bi libateke rewşenbîrî û zanistiyane heye ku zimanê me bikarê ser lingê xwe rawest, ku bikarê milê xwe bidê milê zimanê ditir li vê cihanê. Ziman wek mirov bi laş û giyan e, li ser sistîmeke taybetî jiyana xwe birêve dibê. Eger me ev laş xiste ber sistîmeke xwehêr de, helbet dê bikevê jîngeheke nesaxlem de, ku bi awakî nesaxlem şin werê. Inca mirovên xwediyên ziman ew in berpîrsên geşpêdan û peresendina ziman in. Ziman di sistîma xweyî

dengsazî de bi tena xwe wek laşekî bêgiyan radiwestê, lê komelgeh bi axêver û nivîserên xwe ve ew in yên ku giyanê didinê û pê dilivê û pêşde diçê. Ji ber wilo jî barekî giran dikevê ser milê nivîseran de ku bala xwe baş bidin zimanê nivîsînê dema ku berhemekî belav dikin. Ji ber ku pareke mezin ji xwênerên zimanê Kurmancî, baskê Latîni, agahî û şarezabûna wan di kurmancî de hindik e, lewre, ew pêçêbûn bi wan re nîne ku şaşiyên ziman ji rastîyan nas bikin, bi taybetî di vê qûnaxa em tede dijin ku Kurd çî li Sûriyê û çî li Turkiyê bi mafê rewşenbîrî di xwendin û nivîsînê zimanê Kurdî de şa nebûne, ku ew kêşe wek hinkirin û fêrkirin bikevê warê resmî de, bi awakî ku dibistan û fêrgeh hişkere vebin, û bibin berjewndiyeke giştî ji xelkê re da ku zarokên xwe di dibistan û fêrgeh û zankoyan de fêrî xwendina zimanê xwe bibin. Ji sedê salan ve xelk zimanê xwe di fêrgehên de dixwînin û fêr dibin, Kurd tenê wek netewe di vê cihanê de ji vî mafî bêpar mane, lewre jî, nivîserên Kurdî di nivîsînê xwe de diterpîlin û şaşiyên wan li ser rûpelan diyar dibin. Mebesta me di vê gotarê de ne ku em amajê li hemî şaşiyên heyî bikin, tenê em dixwazin bala

xwêner û nivîserê Kurmancî bikêşin mîjareke wilo ku zimanê xweyî nivîsînê biparêze. Min jî hin nimûne ji gotara Kurdekî Sûri anîne, bi ser ku şaşî ne tenê di vê gotarê de hene.

Eger me ev mijar di babetê şaşiya peyvê de da ber xwe, ji xwe babet yasayên xwe jî aliyê lêkolîna peyvê distêne, ku ew jî hemelayan e, û di van warên jêrî de tên:

- 1. ferhengî (lexical),
- 2. yan formkî (formal),
- 3. watesazî (semantic)
- 4. û yên ditir ...

Ev alî her divê werê destnîşankirin bo ku coreyên şaşiyê werin naskirin. Helbet şaşî di zimanê kurdî de hemî ne wek hev in, ya ditir jî sedemên peyda bûna şaşiyê jî ne wek hev in, bo nimûne, şaşî hene ku çapgeh û tîprêz pê berpîrs e, her ev jî xuya ye, û şaşî hene nivîser di ber de berpîrs e. Şaşiyên nivîser jî xwe armanca vê gotarê ye, taybet bi peyva ferhengî werdigirê. Şaşiyên nivîser hene ji bêhemdî bê, heye jî bihemdî eva han jî heye bihemdî wa tê ku hin nivîser nivîsînê bi hestekî serberedayî bêpîrsîyan pênûsa xwe tavêjê nav, yan heme çilo hate ber devê wî peyvê bavêjê berela derdikêve. Ez wê Nivîserêkî Çilo ezanî dibê hokarê belavkirina şaşiyên di ziman de. **Kurdînivîserêkî Qamişloki navûnişana gotareke xwe xistiye (şirûsa**

pênûsê) – wergêrana derbirrîneke Erebi ye, ku dibêjin: (من وحي القلم) – belê kêşe di anîna peyveke di Kurdî de nîne, ne di ferhengan de û ne di bîrhênana xelkê de. Baş e, çirok çî ye? Yan em bêjin şaşî di kû derê de ye? Kêşe ew e nivîser li şûna şêweya rast jî peyvê bidê, ku (sirûş) e, ya şaş (şirûs) daniye, û her wê jî wate li nik xwêneran wunda kir. Ji ber ku di ferhenga Kurdî de peyvek bi nivîsîna (şirûs) nîne, Peyv bi sinê derêspê dikê, û bi şinê dawî pê tê, nabê em herdû dangan pev biguherin, ango dengê /s/ bixin şûna /r/ de, wilo peyv jî hev dikevê û ev şaşî nakevê ber kêşeyên zargotinê yan zarekî (diyalektê) de. Peyva "sirûş" ango (وحى wehhi) peyveke Îranî ye ku hem di Farişî bikar tê, hem jî di zarê Soranî de û di helbesta Melayê Cizîrî de jî hatiye, dema dibêjê: ((Da min sirûş, wer mey binoş, zewq û xuroş, lo çûm ji huş Ji "şîweya yar bû xuya, ew nej me ye, engorî bû)). Belê, karekî baş e em di nivîsînê xwe de ji ferhenga zarê Soranî xwe tîr bikin, lê eger em vê peyvê xweşik nas nekîn, nabê heme çilo hat ber devê me, yan ber çavê me, em bêjin yan binivîsin. Em jî bir nekîn şaşiyên ziman di ferhengan Kurdî de gelek in, lewre pêwîst e nivîser gelek ferhengan bixwêne

ta ku şêweya rast nas bikê. Nivîser di her sê rêzên pêşî yên gotara xwe de çend peyvên bêserûber anîne, hin jî nezani, û hin jî wî pêkaniyê (tevdezan, girevtar, kêşeyar, hemî dar). 1. Peyva (tevdezan) jî xwe nabê peyveke ferhengî û bikar nayê, belê di Kurdî de (ferezan) jî (fere) û (zan) peyveke ferhengî pêk tîne, û wateya ew kesê zanebûnê w. ١٠٤٥ ب٥, ١٠٤٤ ت٥ gotin ferezan. belê ka (tevdezan) çî wateyî didê?? 2. (girevtar) şaş e, ya rast (giriftar) e peyveke Soranî ye. 3. tew (hemî dar) çî ye?? 3. (kêşeyar) her jî "kêşe" anîye. Eger danîna peyvê karekî hesanî ye, eger em sere-sere tede bajon, belê wate vê piroseyê dixê bin yasa û destûrên zimani de ku babet ne berkêfî ye. Nivîser dixwazê peyvîne nû çê bikê di riya dariştin û lêkdanê de bê ku bizanê ka wate di vî qalibî de çî mebestê didê. Baş e, çêdibê her yek hat û çî hat ber devê wî, bêjê, ev kêşe dibê wek em bi zimanê gelêrî jêre dibêjin (XITABA QERMO). Çiroka xitaba Qermo ev e: (Dibêjin, axê ji gundiya pîrsî ka gelo kî dikarê bi zimanekeî ditir ji bilî Kurdî jêre gotinekeî yan em bêjin xitabekê di nav zîlamên de bidê. Axa xwest heme bi kêmanî mirovekê jêre çend gotina bi Turkî bêjê bo ku Axa ji wan fêr bibê, Qermo mirovekî hejar û bêpirgal bû, got: Axayê min, ez

zanim, ka li min guhdar bike, va ezê ji te re xitabekê bi Turkî bidim. Axê got: deka Qermo ji me re bêje, lawo. Xitaba Qermo: ((Sindik savar, burxul dêra, qarşıka bîzinê, repp-olmîş)). Helbet ne ku heme ev nivîser tenê dikevê şaşiyê de, ez bawer dikim bi sedê nivîsaran di vê cökê de dibûrin. em naxwazin wan bixin nişana tîrên rexnê, belê em wan agadar dikin ku her yek ji aliyê xwe de guh bide nivîsîna xwe û kêmasiyan kêmb bike: Piştî bifirêketinê, gerek nivîser ha jî xwe hebê û peyv rast û dirust bidê, ji ber ku eger me peyv bi şaşî da, emê nişên nuhatî şaş fêr bikin, di paşerojê de hîlanîna wan şaşiyên bi hesanî çih nagirê. Di jîmara yekê de ji govara Diwar, li piştta rûpelê bergê dawî, di rêza herî dawî de, risteyek bi şaşî hatiye dariştin, ku ew jî weha hatiye: ((Her nivîskar jî naveroka nivîsa xwe berpîrs e)). Di vê rista bûrî de daçeka (ji) bi şaşîti hatiye ku wate wek mebesta tê xwestin nadê, di baweriya min de awayê rast gerek weha hatiba: (Her nivîskar di ber naveroka nivîsa xwe de berpîrs e) yan bi awakî ditir: (Her nivîskar berpîrsê naveroka nivîsa xwe ye).



Hunermendê Kurd Beha Şêxo Ji bûyer Re Daxive 2/2

- *Yê ku lêpîrsîn bi me re dikir, rahişt şivê û ser serê min û M.Şêxo re sekinî û pîrsî: Mala yê ku li cem te tomar kiriye li ku ye?*
- *Hêzên " Savak " li Iranê B.Felek girtin û gotin: Çilo te gotiye (Em bê dost û bêkes in), mane va em we xwedî dikin?*
Her deh deqeyan li B. Felek li pişt xwe dinerî, û digot: ez dixwazim wêneya gund di mejiyê min de bimîne, naxwazim jibîr bikim.

HUNERMEND
Mihemed Sêxo
1948 1989/3/9

Hevpeyvîn : Qadir Egîd

Mamoste tu dikari hindekî ji me re li ser girtina tomargeha Felek ji hêla rêjimê ve baxivî?

Girtina tomargeha Felek ya ku pênc salan berdem kir ji bo sedemake piçûk bû, ew jî tomarkirina kasêtekê bû. Piştî ku min girtin, min siwar kirin û berê min dane malê, em çûn malê, nehiştin ez dakewim, gotin: Kijan derî ye, min nişanî wan kir, çûn Bavê Felek anin, û em her du birin "Cina'yê".

xortên ku kasê li cem min tomar kiribûn bira bûn, niha şehîd ketine; Xwedê wan bi dilovaniya xwe şa bike, "Nûredîn û Salihê Gul" bû, ji bo wê tomarkirinê em hatibûn girtin, berî wê bi se'etêkê hatibûn cem min, gotin: Divê tu navê me nedî eger tu navên me bidî, emê têk herin, navê Hêlîn û Metîn bide, ew jî kurdên me yên Bakur in û bi destûr li vir in, min jî Salih re got: **Bera dilê te di cih de be, eger min bidar vekin, ez navê te û Nûredîn nadim.**

Li "Cina'yê" min ew nav gotin û min got: Hun niha keçikê binin pêşberî min jî, belkî ez wan nas nekim lê lawik nas dikim.

Yê ku lêpîrsîn bi me re dikir, rahişt şivê û ser serê min û M.Şêxo sekinî û pîrsî: Mala yê ku li cem te tomar kiriye li ku ye?

min got: Baş e, ma çi yek were stiranekê tomar bike, ez adrêsa mala wî distînim, em hin wilo diaxivîn du endamên wan ew xortê me yê jî Bakur anin, avêtin cem me, li binê lingê wî xistin, M.Şêxo rabû bi destê wî leşkerî girt û got: Tu çima lédixî? got: Bera mala hevala xwe pêş me bike. M.Şêxo got: Ne bi lédanê ye. Lawik bi Erebi ténagihê, M. Şêxo bi kurdî jê re got: Mala hevala xwe pêş wan bike. got: Na, wê heval bêjin min tu xayin î. M.Şêxo got: na, wilo nabêjin.

Piştî dora nivseetê, nasnameyên me ji me standin, em birin zindanê, seetek derbas bû, keç jî

xuya kir, ew birin beşê jinan, û lawik jî anin cem me.

Em ji wir birin " Siyasiyê " û pişt re " Emnidewlê ", em li sêşaxên ewlekariyê gerandin. Wê çaxê M.Şêxo di belgeyên fermî de tomargeh bi navê min danibû, nasnameya min biribû, û dikan li ser navê min tomar kiribû, min ev yek nizanibû, wî di Cêbê de ji min re got, min jê pîrsî: Te çima wisa kiriye? got: Mane min bi pereyên te yên dawet û zemawendan ev dikan kirî ji xwe re binerin mezinayîya B. Felek ta çi astê bû . Bi rastî ji hêlekê ve ez aciz bûm û ji hêlekê di ve kêfa min hat jî ber berpisyarî û tewanbarî ji histê B. Felek derket û ket stuyê min de.

Em heft rojan di zindanê de man, ewên di berdabûn ez û M.Şêxo tenê mabûn, roja dawî em birin ofisa Emnidewlê, ez û B.F li hember hev bûn û yê berpîrsî li pişt masê bû, rahişt kilîtn min û got: Tu kar bi vê partiye re dikî, min got: Na. got: Naxwe bi kijanê re?

Çiqasî pîrsên xwe vegerandin min got: Ez hunermend im û tomargeha min heye, ez karê siyasî nakim, tevî rêz û hurmeta min ji gişan re heye, lê ez dûtî siyasetê me.

Got: Tu bi kê re kar dikîbêje û fermo kilîtn te, û eger evên kasêtan jî bin, ew li cem me cihê hurmetê ne, û em piştgiriya wan dikin. min got: Na, ez bi kesî re kar nakim. Got: Rabin herin û bera kilîtn te li cem me bin. Wê çaxê Se'et 11ê şevê bû, lewre em bi meşê çûne malê.

Piştî du rojan ez çûm cem rîvebîrê herêma Qamişlo, min daxwaznameyê ji bo vekirina dikanê pêşkêş kir, gotin se'et 11ê nivro li benda me be, kêfa min hat min go wê dikanê vekin, se'et 11 du Cêb hatin, ez siwar kirim, berê xwe dan tomargehê, derî vekirin û rahiştin her tiştî, kasê û alavên tomarkirinê heta mixên diwaran rakirin, melks û misîn jî birin, bi min imze kirin, girtin û mûma sor lëxistin. Xelkên

Qamişlo neçar mabûn, li ber tomargehêkom bûbûn li me dinerin, M.Şêxo jî di nav wan de bû, bi kezebek şewitî temaşe dikir, kolan tije bû, careke di min xistin Cêbê de û ez birim zindanê, ez şevêkê di tê de mam, roja di li Niyabê ez berdarm û dikan pênc salan 1987-1992an ma girtî. dema M.Şêxo koça xwe ya dawî kir - mixabin - tomargeh girtî bû, û ew hesret di dilê wî de ma û pê re çû gorê.

Dawiya sala 1989an ez çûm cem ciwamêrekî serokê êla Şemer Himêdî Deham, bi min re hat cem parêzgerê Hesekê Mistefa Mîro, hatina wî ciyê spasîyê bû, daxwaznameya min jî parêzger re avêt û got: Dikana û diravên wan li wan vegeirin, roja din li diwana parêzgehê vegeyiam, kaxetek dane min û gotin: Here diravên xwe ji Navenda Çandê bibe, lê dikan divê aliyê biryara girtinê jî bide ango Emin Siyasî.

Tayên gorên bavê Felek tevî çermê lingê wî bûbûn, lingê xwe li cem mala xwişka min dixist nav avê de ta ew tayên gora nerm dibû û xwişka min Emşa tayê wan goran jî nav goştê lingên wî dikşand

Ez çûm Navenda Çandê li Hesekê, pasewan kalemekî kurd bû, gava min gotiyê va kaxeta min jî bo em dirav û alavên xwe bibin, hêsrî ji çavên wî bariyan û giriya, gote min : werin, em çûn, diravên me çadirkirî bûn, wî pasevanî got: Ez her pêncşem tîm wan jî tozê paqî dikim, tê bira min bi zorê min şeraniya wî xist destê wî , ji min re digot ez ê çawa ji dest te bigrim, ev erke netewî ye, min got: Dive tu bigrî, jiber eger yekî ereb yan



xiristyan ba, wê niha doza pênc hezaran li min kiriba. Min dikanekê di kirê kir, bi rastî ez bêhêvî bûbûm, ji ber her sê mehan min daxwaznameyê nû ji bo vekirina dikana xwe pêşkêş dikir û bi nepejrandinê vedigeriya, sê taqan li heqê dikanê min bertil dan û venebû.

Di 92an de kurê rehmetî hecî Ezîzê Ehmedê Üsiv, axê Siha biçûk go ji bavê min re bêje, ez çûm cem bavê wî û min çirok tev de jê re got, gote min: Birazî here, ez tîm Qamişlo. Dûv re kurê wî jî min re got: Em çûne cem yekî mezin û 15 hezar (heqê qelemê) xwestin. Ez çûm şaredariyê gava belge-nameya pejrîrandin dane min, min bawer nekir, xortekî kurd jî Dirbiysiye di polîse de bû, bi min re hat, me xêfk (Qifil) şikand û me vekir.

Di wê kelîkê de çi hestên te hebûn?

Ez ketim tomargehê, li quncikêkê rûniştim û tîr giriyam. Min dîsan qarma tomargehê nû kir (TOMARGEHA FELEK- MIHEMED ŞÊXO), ciwamêrina ji min re gotin: Ew nav jî te re ne gerek e, wê dîsan sere te biêşînin, min got: Eger ji bo nav bigrin, bera dîsan bigrin, û ta ez sax bim bera girtî bimîne, mane ji bo kasêtekê pênc salan hat girtin.

M.Şêxo li Iranê hatibû

nav şinahî bû, me bira lédanê nedibir) ev gotin got : Cihê min deynin, ket nav cihê xwe de û bê ku dê û bavê min deng bikin got: Ez hinekî neheret im. Sibehê, min desmal li milê xwe kir, teşt û sabûn jê re anî, min av li dest kir, gava ku tif kir, xwîn pê re avêt, dema ku xwîn dît serê xwe rakir û li jor li min nerî û go: Ji bo Xwedê tu ji dê û bavê min re nebêjî.

Ez ji vekirina tomargehê bähêvî bûbûm, sê taqan li heqê dikanê min bertil dan û venebû.

Esirkî, ber êvarê, got: Ez ê li ser lingê xwe bigerim, herim cem xweşka xwe ya mezin (mala wê li gundê kêleka me bû). Payîz bû, ji xweşka min re dibêje: Ka teştêk av werin, lingên xwe dixê nav ava teştê, cotek gore bi ser ên xwe yê berê de li xwe kirbûn, tayên gorên wî tevî çerm û goşt bûbûn, lingê xwe dixê nav avê de ta ew tayên gora nerm dibe û xweşka min Emşa tayê wan goran jî nav goştê lingên wî dikşîne. B.F xwişka min sûnd dide ku ji dê û bavê min re nebêje (bera ev tişt jî min tenê re bin).

Gava çû jî, ez û diya min û meriva me Emîna (diya M.Şêxo ya şîr bû), em pê re meşîyan heta Xecoka Mezin, her deh deqeyan li pişt xwe dinerî, diya min got: Tu li çi dinerî? M.Şêxo got: ji bo ez gund jibîr nekim.

Wê çaxê wî digo ez ê herim Elmanya, gava xatir ji bavê min jî xwest got: li min helal bike, belkî em hevdu nebînin...

Tebîni: Di xelaka bûrî de, li ser strana mamoste M. Elî Hiso ev hevok bûrî: (Helbestvan M.E.Hiso ji bilî strana "Bûkê Rindê Cîwanê" nedabû hunermend M. Şêxo).

Ya rast ew e: (Helbestvan M.E.Hiso ji bilî strana " Evîn derdekî mezin e " nedabû hunermend M. Şêxo)

Got: Ez li nav daran bûm. (Me go belkî li daristanê li

Dawîya Plyalê

Hekîm Ehmed

Giranbaro Dilo

** Wa tê firotin ew çeleng
Vêga bi dolar û fireng
Gazî dikî nayê te deng
Ey lal û bêzaro dilo
* Tu l'ba keve lîngan bilivîn
Pir dûr e ev rêça evîn
Yarê ji nav destan derîn
Wek şêr û wek maro dilo
*(Du malik ji diwana yeke-
mîn /Xelaf/ a seydayê
Tirêj).*

Wa tê firotin ew çeleng: Di vê xêzê de du çînavên nişankirinê hene (wa, ew), her du jî ji nişankirina dîr re ne, ev diyar dîke ku firotin ne nêzikî nivîser e, li welatêkê din yan di odene veşartî de dibe. Evîndêra tirêj jî di vê xêzê de nenas e, tenê pesnê wê (çeleng) naskirî ye.

* Vêga bi dolar û fireng: Bi peyva (vêga), seyda xwêner dixwe rewşê de, dide xuyan ku bûyer niha dibe. Têvî ku (dolar û fireng) peran û bazarê bi gelemperî dinimîn, lê ev pere yê derve ne û bi taybet yê hêzên sereke di çîhanê de ne, ewên çarenûsa gel û welatan di destê wan de ne.

*Gazî dikî nayê te deng: li gor rêzika kesandina lêkerê, yê ku gazî dîke guhdêr e angû dî e, wek di xêza din de diyar dibe, tekez yê deng nayê jî dî e. Wîlo dî dîke hawar lê ew bi xwe dengê xwe nake, ev jî asteke bilind ji azarkêşiyê ye.

* Ey lal û bêzaro dilo: Piştî alava bangê, navê bang lê bûye dereng dimine, pesndanên wî (lal, bêzar) berî wî hatin, ev awa dihêle xwêner bi hestên xwe li benda dawîya xêzê be ku nas bike evê lal û bêzar kî ye. (Lal û bêzar) du peyvên hevwater ne, di helbesta

klasîk de gelek hevwater bi kar tên ji bo serastkirina terazîyê û tekezkirina wateyê. * Tu l'ba keve lîngan bilivîn: Siwarbûna ba ramanêke dastanî ye, di çirokên olî de jî heye, mebest jê wateya lez û xurtiyê ye. Her du lêker jî (l'ba keve, bilivîn) hiştin ku tevgerê xurt bê xwestin jî dî, çimkî bûyerekan raweşek awarte çêbûye, ew jî firotina çelengê ye.

* Pir dûr e ev rêça evîn: Niha em zanin çima jî dîl xwest ku li ba siwar bibe, niha wêneya çelengê jî zelaltir bû, ji ber têkiliya seyda pê re (evîn) eşkere bû. Ji bilî wê, ev hevok weke pendekê yan danasinekê jî hêla xwediyê ezmûnekê ve hatiye saz kirin.

* Yarê ji nav destan derîn: Têvî ku rêça evînê dîr e, Tirêj jî dîl dixwaze ku yarê ji nav destan rizgar bike, ew destên ku yara çeleng firotin bi dolar û firengan.

* Wek şêr û wek maro dilo: wek şêr (wêrek û bi hêz), wek mar (pendyar, aram û bi pîlan), ev tev jî dîl re divîn li ser rêça evînê ya dîr.

Bangkirin û gaziya dîl jî li cem hemî miletan ji berî helbestê ve heye, ew derfetê vedike ku gotûbêjek hundurî (monolojêk) jî hundurê mirov derkeve qada guhdêran.

*Li dawîya xuya ye ku mijara helbestê welat e, di wêneya yara çeleng de, lê xwêner dikare bipirse: gelo wê çaxê jî weke rewşa îro, helbestevan (zimanê gel) bawer dikir ku bi bazaran welat tê firotin? yan pêşbîniyêke seydayê Tirêj bû ku wê demek bê tê de eşkere welatê çeleng - yê ku rîya evîna wî pir dîr e - bî firotin bi dolar û bazaran?

Û tu Jî..



Şêro Dalîn

Û tu pala xwe didî kendaîlên dilê min yê kerixî û xwe bi devlinga

gotinên kor ve asê dikî, erê yê kor..Ma ne bîna termên min jî derayan difûre ma ne mayîn hemî di bin min de vêketin ma ne çadir bi çadir hevî didim ku li xwe bigerim, Newêrim li çavên evîndarekî mezye bikim ji têkçûnan, nizanîm ev pêlîkên avê bi kefte-letta xwe min gêjî dikin yan jî dihêlin ku di ferhenga navên xwe de wînda bibim?!

Koçberî

Lewend deriyê hewşê li paş xwe girt, zivîrî berê wî kete cadê, cade vala bû, di cihê xwe de li ser rexerîya ber derî rawestî ma, li rûdêma taxê nerî, mîna birûskê li dilê wî da, matmayî û dilşikestî ji xwe pirsî: Gelo ma ev e taxa min.....!?

Vê sibê gundê miftî xemgîn û dilşikestî ye mîna dayikekê şeva bûrî zarokên xwe bi oxirikbûn , vê carê ne wek hemû caran, ne wek havînan dema ku çemê ceqceqê diçike û dibe cokerê ava karizan, komên kelmêşan bi ser zarokên wê ve dişîne, xewa şevê jî çavên wan direvînin, nexwîşyan bi xwe re diweşînin.

Imran Yûsiv

ne wek buharan dema dewleta turkî jî aliye xwe ve avê berdide û lehiyê diyarî wê dike gelek malên wê bin av dibîn û pir caran zarokên wê jî dibin qurbanîyên lehiyê. Vê sibê gundê miftî birîndar e, bêtir jî her demê û her çaxî. Ev taxa bi salan li ser qiraxa çemê ceqceqê jibîrkirî mayî, her dem karibû bi xwe birînen xwe derman bike û jî nu vejine, êdî kî wê carê wê birîna wê derman bike taxa ku her dem ezmanê wê rêya koçberîya refên balindan bû ku payizan jî bakur koçber dibîn bi alfî başûr de, havînan jî başûr berê xwe didin bakur, îro zarokên wê bi refan koçber bûne.

Zanîn



Eziz Xemcivîn

Bila derdê min bi hilata Rojê re çareser bibe... Bila ji xwînrîjandinê re derman bête dîtin... û bila tu serê xwe bi kuştinê bilind nekî... Zarok û neviyên xwe li ser çandina gulên perwerde bikin. Dilê ko dikare çivikan bikuje, bê guman dê ji kuştina mirovan hêsantir li balê nebe... Rewşeke metirsî ye, çavên xwe li devxwîniyê vedikin. şevê bi kîna xwe dagirî dikin. Hin dibin lîstok û çarenivîsa miletekî dispêrin rêjîman... hin xwe bê kesay

etî dikin... hin jî paşûpê li derfetan siwar dibin... Kolanê bernede û di guhê wê de dengê muzîka hezkirinê vêxîne... dengê tîfingê jî mejiyê zarokan bibilîne... Hey mirov bi destê evîne bigire û bike mîna Bûka Baranê mal bi mal ewê bigerîne... Bila çavên bendewar li benda spîdeyê aram û hêmin bin, bila ne dilşikestî bin... Hêtûneke mîzgîniyê be, ne ji bo sotinê be... hey meşxela hezkirinê helkîrî bimîne... Şev pir dirêj e, evîn li ber deriyên kînê dijwariyan dibîne, derî têne girtin, dar têne hilweşandin... Bikene bila gîrnîjîn bibe Kanî... Bila êş mala xwe bar bike... Nesrîn xemgîniya xwe piştguh bike... Sosin li baxê dilê me geşbîniya xwe vegêrine... Kurdo, guhdîrê, yefşê bîdest bixîne. Ev roj heye, gula azadiyê li ber bişkuvîne ye, bi zanîn av bide...

Pêt û Hiner



Mahîn Şêxanî

Yarê li min mezye kirî dergehê dilê jêr vekirî xwe derbaskir bi tenahî herdû çavan himbêz kirî min got: Canê li min nener cerg û canê mî pêt û hiner ji awirê te dil daye der çî fermate ne çî kirî evîna xwe li dîl te çand bi lêvan re silav te şand heta mêtî te xwe gihand rewan mabû xwe çenkîrî bi dilovanî bi nazdarî xwe spart min bi yek carî da min soz û biryarî xwîna min jî ter talan kirî

YASMÎN

Xorşîd Şêxê

wê sibe, ev guldank di qutiya rojan de bê şikestin, wê sibe, demên gewez bi zaroktiya vê xwîne ve daliqîn, wê sibe, çînar û bî, siwar û sawêrê cî tawî û bawî bibin. çîma bavo, çîma lo.?! we negot piştî êvara yasminê, wê çîya di siya çolan de werkin, wê hêlinên refên qitkan refên têtî û kevokan penaberkin, wê sirûda çol û dşetê kirrî hev kin, we ne got: morikên sibe bi histên hespên pilanan ve çûne. ----- çîma bavo..? we ezmanê hejîr û mêwan bi hev ve bigirta, we sirûda baran û berfa çîya bi xwenda ji rûbar û çeman re, ji xuziran re ji giya re, ji çûkê serê sibehan re bi hostayî em diçûn ne perav ne sînor tenê yasmîn bi mûman re dikenya.

pîzrûkên baranê

Kurteçîrok: Ebas Mûsa

Bo çî dema mero bêjî têtî jîyanê, rojbûna wî nayê jîbîrkirin, xelkê gund tev dîzanin ku ez di dşepêka Êlûnê de bêjî hatime jîyanê, hîn pelê daran xweşik nehilweşîya bûn. Bêtir ji 50 malbatî li gund dijîn, tevan bi hev re pira gund tebût hemberî lehiyan çêkirin, bi hev re kelpîç dibirîn bo xaniyan lêkin, bi hev re di çahiyan de dîlan dikirin, û bi hev re li ser miriyan dikirin şîni. Bi hev re li melê gund guhdar dikirin di rojên înan de. dengê mele tûj belav dibû:

(Ta kengî emê di bin xezeba xwedê de bin, carcaran xwedê xezeba xwe ser hinek gundan de dibarîne, dema ku belqîtyek"mesexek" di nav wan de bîji). Di nimêja zêwê de jî, wiha got: (dê xwedê baranê bi ser me de biherikîne dema ku em bêmeriya wî nekin, û belqîtyan ji nav xwe derînin Xwedê destê xwe hertim ser vî gundî re dibir, lê dema belqîtyek ketêyê, baran jî ji asîmanan qut bû).

Berbangar rojeka Êlûnê bû, jinek ciwan pora wê bi 5 guliyên hûnandîbû rahîştîbû pêçekeke sipî ku neqşeya xweşik li serê neqşandî bûn û zarokê kur têt de bû. ser ting danî û zû sinorê gund derbas kir, di wê demê de şivanek li ser dengê vî zarokî hat, dema ku ew bir malê radestî jina xwe kir, û bêyî gelek danûstandin navê Xwedê-da lê kirin.

Ez di civaniya xwe de me, hertim dengê wan digêje guhê min, ku bi sîucê min baran nayê, bi sîucê min berket jî vî gundê pîroz qut bûye, bi sîucê min jî ev du salin ku baran qutbûye. Ez im, Xwedêda me, ez im sîucê xerabiyan ku li gund diqewimîn, carcaran vî tîştî ez jî xew radikirim, û xewnin giran ji minre bardikirin.

Rojek ji rojên payîzê bû, dawîya Êlûnê, êvara roja îne ye, nêzikî berbangê ye, min gelek mazot derdora gund rijand û min gelek derbikên şixatê vêxistin, û agir bi dijwarî vêket.

qirşên gund agir gurdikirin, agirê gur gund kîre mîna fenerekê, û ez jî ser tixûbekî rûniştîbûm min li fenera agir melûlî mezye-dikir û pîzrûkîna baranê hêdî hêdî pora min şil dikirin.

Hêvî

Nêçirvan Bedrî



Hêvî dixwazim deng bikin dunya li wê pir xweş bibê Ken ser rîwê wê xêz bibê tarî li ser wê zû hilê Rondik jî kêfa jî werin kul û keser dîrî te bê kul ser dilî zû rabîbin daxwaz ji te fermînan bibê kovan binûsin ser te peyv şahtir yekî ser vê dîna havîn li wê hînik bibê zîstan li wê pir germ bihê bûhar timî dora te bê payîz li wê qet hişk nebê vîna li gel te hêz bibê êş û keser dîr wê biçê wîlah tu yî mustahilî xoşî li ser vîna te bê xewn û xeyal zû pêk werin omîd û hêvî cih bikê lava dikim her bo te yar keyfa te di pir şah dikê xozi du a zû pêk werin da xweş jîyan bo wê bizê

Dayika Kurd û Ziman



Eskerê Boyik

Gelê cihanê tev ji zimanê xwe re dibêjin zimanê dê. Ji ber wî zimanî jî dayika xwe hîn dibin. Dema zarok nû tê dinê berî her tiştî dengê dê dikeve guhê zarokê. Zarok bi wî dengî mezin dibe. Zanyar dibêjin zarok hê di zikê dê de dengê dayika xwe nas dike, hînî zimanê dayika xwe dibe. Weke şîr bi zimên jî zarok bi dayika xwe ve tê girêdan. Bi dê jî ew qewmîtiya xwe, gelê xwe, welatê xwe nas dike. Xeyset, bawerî, hezkirin, xîret, erf-edet û kultûra mîletê xwe niqîtik-niqîtik bi şîr û zimanê dê re di nava zarokê de rûandin û dibin bingeha jiyana wî ya pêşerojê...

Tiştêkî veşartî nîne ku bi derwanan dagerkirinê Kurdistanê yê civakî û ruhî astengiyên herî mezin danîne li ser zimanê me... Xwendevanên gel, oldaran, mîr û hakimên me, desthilatdarên me yên xweyî hukum, li zimanê me xweyî derneketine, ew xweyî nekirine, dayikan, dayikên me yên şermok, dayikên me yên barê malî yê giran li piştê, dayikên me yên xweyî kozî- zarokên hûr, zimanê me xweyî kirine, kurdîtiya me, welatê me, gelê me ji windabûnê xilas kirine.

Mala Kurd bi jinê ava û qewin bûye. Jin stûna malê ye, jin tifaq, nav û namûsa mala kurda ye.

Rêwî û zanyarên biyanî, yê hatine Kurdistanê yan tê re derbas bûne, li ser azadî û xebathizî, marîfet û mêvanhizîya li jina kurd ecêbmayî mane, di wê derheqê de nivîsîne. Di nav gelên Rojhilatê de jina herî azad, serbest û serbilind dîsa jina kurd e. Jina Kurd tim jî piştî xwe daye piştî zilamê xwe, xebitiye, zarokên xwe, mala xwe xweyî kiriyê.

Ji aliyê din ve siyasî, piro-paganda û xebata hinek hêzên Kurdan jî bi navê azadiya jinê, wekeheviyê û demokrasîyê, bi rastî wezîfêke ne ewqas qenc di wî warî de lîstin. Gelek nîrxên giranbiha, ku himê bingeha tifaq û qedîmiya malbata Kurd ya dîrokî bûn hatine feşkirin, bêrûmetkirin. Bingeha zimanê dê jî

hedimî... Bi texmîna min se-bebekî herî bîngêhîn, yê wî halê xeter, ku zimanê me li Bakurê Kurdistanê tê de ye, ev malwêranî ye. Piro-paganda hêzên Kurdan yê niha di TV, radyo, rojneme, kovar, malperan de, tev di derheqê azadiya jina Kurd de dibêjin, dinivîsin, civîn û konfiransên jinan, komele, partî, li nav partîyan enî û beşên jinan ava dikin. Bang li jinan dikin ji "kap û bendên" mêr, malê, malbetê azad bin, derkevin kûçan, kolanan, çîyan, civinan, meşan, mêtîngehan.

Û bi rastî jî jina Kurd, keça Kurd, heta pîrejina Kurd jî ji malbetê dîrê kirin, qetandin, derxistin kûçê û kolanên bajarjan. Bê bîngeh, bê pêşdeçûyîn û perwarde, bi zorê, bi piro-paganda sexte jinê jî nîrxên morala mîletiyê ya qedîm qetandin û jina Kurd a nû afirandin tevî hinekan wa got: (Azadiyê bi xwe re bi hezaran pirobîlemên nêgativ anin li nav malbata Kurd...).

Mixabînin payê jinên kurd yê "nû afirî" zimanê xwe jî nizanin û zarokê wan jî zimanê dê hîn nebûn.

Kes derheqê wezîfa jinê ya qedirbilind û pîrozî nafikire, wezîfa dayikbûna wê, perwerdekirina zarokan bi ziman û ruhê kurde-wariyê, xwe-yîkirina yekîtî û tifaqa malbata qedîm, xwe-yîkirina şerm û jinîtiya wê, ku bi derwanan bejna jina Kurd xemilandin. Erê, pêşketina jinê pêwîst e, wisa jî bi pêşketin û guhestinên derwanê re, jina kurd jî tê guhestin, pêş dikeve.

Çima ma zilamê Kurd di Kurdistanê perçekirî dagirkerî de azad e? Heta Kurdistan azad nebe, ne zilamê Kurd azad dibe, ne jî jina Kurd re rû û karînen azadiyê çê dibin...

Li halê hazir pêşketin, azadiya jinê gereke neyê şaşkirin bi bînpêkirina nîrxên mîletî giranbiha re. Dibe xwendevan min paşverû hesab bikin, bêjin ku ez dijî azadiya jinê me... Ezê îro jî, sibê jî destê wê dayika Kurd ramûsim û bidim ser çevên xwe, ewa ku zarokêkî bi ruhê kurde-wari, welatparêzêkî hêja, rewşebîrêkî mîletî eslî jî bo pêşerojê gelê me perwerde dike. Çi ye, ma Barzanî û Cegerxwînen nû, Şêx Sîhîd û Seyîd Rizayên nû, Celadetên nû jî gelê Kurd re ne pêwîst in?

Kax xwezi dewsa wan kûçê û kolanan, van meşan û mitîngan dayika kurd bi merem, rûniştî di mal de bi zimanê xwe, lawên wisa perwerde bikira. Wê demê kesî nikaribû Kurd bihelandana, pîrsgrêka windakirina zimên jî wê tunebaya.

Komela Keran



Bavê Serbest

Ketiye ser zimanan çawa komelek bi navê Komela Keran jî hatiye damezrandin, hin matmayî dimînin ji wî navî, hin dibînin ew bi xwe wek pêkenonkekê ye û hin jî wêrdigerînin wek bersivêkê li ser perçebûn û pîrbûna partiyên kurdî. Lê tevî ku min ta roja îro rêbaz û minhaca wan nedîtiye, ez bi xwe dibînim ku si-logan di naveroka xwe de pir watedar e, dibêjim heger wê komela bi rûmet navê şêr li xwe kiriba, wê tevan pesnê wê dabana bê ramyarî, tev ku şêr bi xwe ajelêkî devlok e, mirov xwe e, ziyanker e, ne tenê ji bo mirovan belê li ser daristanê bi giştî.

Di bawerîya min de, her tişt di wê jîngeh û xurîstê de gerek bi ziyarî û sudeya xwe bê nîrxandin, çî canûr bin, çî tiknîlociya be, wek mînak ker, ew bi xwe beşê herî mezin jî wê mijarê ye, ajelêkî bar bi hêr e, azarkêş e, bihanyan li xwarinê nake çî em be dixwe, nuşgura pez be, gelaş be, ta bi qaşilê daran, gelek mînak metelok, pend, çîrok, helbêst û ta bi lîstikên zarokan li ser rola ker hatine axavtin û bikanarin wêk :



Li hevsera xwe xist û doza wî rakirin Dadgehê

Welatiya bi navê Lîna Xelîl ku gelek caran ji aliyê hevserê xwe ve rastî lêdanê tê, neçar ma berê xwe bide Navenda Zanist û Perwerdeya Jinan a navçeya Şera ya Efrînê û li hevserê xwe gilî bike. Welatiya bi navê Lîna Xelîl (30) jî şênîyên navçeya Şera ya Efrînê ye, gelek caran ji aliyê hevserê xwe ve rastî lêdana tund, hov û bînpêkirina mafê. Lîna piştî gelek lêdan ji hevserê xwe xwarin, neçar ma ku berê xwe bide Navenda Zanist û Perwerdeya Jinan a navçeya Şera ya

- mêrok kotanê kar e, kerê malê ye.
- ker bi kurtan, pîrek bi kiras û zeftan.
- nikare bi ker, dibeze kurtên.
- şîrê kerê jî dehqêka wê re ye.
- were û wî kerî di wî buhurî re derbas bike.
- kerê barê merê ne lê be, bera tê de bê.
- kero nemir, qîvar hat, gulê nemir, buhar hat.
- lawîk çû seferê, vegerya kerê berê.
- li kerê mirî digere, ji bo nala jê bike.
- ker ziriya, siwar got: hêşeryo heger xwiya malê jî te bihata xwestin tu ne dizirya.
- kerek tevî kurtanê xwe di navbera herdu dostan re derbas nabe. Hatiye gotin ko di heyamekî de, axê hoza Omerîyan yê di hate nasîn bi xwedêkê çalê, carekê fermanek ser dev weşand got : çî mirovê Omerî yê ko şeqamekê li birayê xwe yê Omerî bide, wê axê kerê wî talan bike, tê zanîn ko ker pir bi rûmet û nîrxdar bû di nava hoza Omerîyan de, çawa her malek kerekî wan hebû û ker bi nîrx bû, wê bi pîlan û himşengiyê şerê xwebix-wetiyê di nava hoza Omerîyan de sînor jê re hate danin. Bi rastî navê ker lê ye, tim û tim amade ye, ji bo kar kevirê kêni ye, şivan wî bi xwe re dibe ber pez, rezvan kar û barê paleyiyê, kişandina êzing û qîrş û qalên çolê, aşvanî kişandina avê çî ji birê be çî ji çem û kaniyê be, bi giştî jiyana mirovê çiyayî nemaze yê kurd be hebûna ker pir zor û aloz bû, mirovên çiyayî ker diditin wek yek ji xêzanên malê. Du cureyên keran hene, yê şehri û yê berbider ango yê hûr, her yek jî van herdu cureyan taybetiyeke wî heye.



Li Bîrtanya û Li Mûsilê Parastina Keçan Ne Wek Hev e

Ebû Bekir Elbexdadî yê ku xwe wek Xelîfeyê Misilmanan bi nav kir, xwest ku du milyon keçên Iraqê Sinet bibin, ji bo dîrkirina wan ji guneh û nebaşîyan. Hêjayî bîranînê ye ku rêxistinên mirovî û mafnas li dijî wê diyardeyê disekin, ji ber ew ne bi xerakirina laşê mirov re ne, bê sedemêke bi tenduristiyê ve giradayî be, lê ew sinetkirin tenê ji bo adet û ramanên çewt pêk tê. Komeleya giştî ya Netewên Yekbûyî UN jî, biryar standibû ku sinetkirina keçan bi dawî bibe û ew weke kiriyareke kirêt pesin dabû. Di daxuyaniyê de Bexdadî dibêje ku ew biryar wê civaka Misilmanan û keç û kurên wan biparêze. Ji ayyekî din ve, li paytexta Bîrtanî Lûndinê 700 kesayeti civiyane ji bo bidawîkirina sinetkirina keçan û wê bidawîkirina sinetkirina keçan û zewaca zarokan, di nav wan de serokomar û çalakanên civaka sivil hene tevî Netewên Yekbûyî UN.

Di wê civata ku li ser asteke bilind ji berpirsan dibe, wê amanc mafên keçan wek bidawîkirina sinetkirina keçan û zewaca bi zorê û zewaca zarokan. Civat dixwest derbarê wan mijaran misogerîne nû ji rêxistinên taybet û berpirsên olî û hikûmet û rêxistinên civaka sivil bistîne. Wezaretê karê derve ya Bîrtanî eşkere kir ku yasayekê nû keçe warê biçûkirinê ku kesê zorê bike ji bo zewacê wê rastî tawaneke cinayî bibin û sizaya wê digihe 7 salan zindan. Rapora wezaretê karê derve ya Bîrtanî dibêje ku Encûmena Misilmanên Bîrtanyayê ragihand ku sinetkirina keçan kiriyareke ne Islami ye, lê ew tersî prensîpên wê olê ne. Ji bilî daxuyana DAIŞê, pêşveçûnê erênî derbarê wê mijarê li cihanê çêbûne, ev civata parastina keçan jî li Lûndinê wê di wî warî de be.



Tenduristî û Havîn

Piraniya pisporan dibînin ku tîrma (Nexweşiyên Havînê) ne pir rast e, ji ber ew êş di hemî demsalên salê de hene, lê di havînê de pir dibin, bi sedema bilindbûna asta germbûnê û mana li ber hewayê alavên hênîkirinê. Ji bilî wê seqaya germê arîkariya paktîriya û mîkroban dîke ku geş û zêde bibin, ev dihêle xwarin û vexwarinê zû xira bibin, di encamê de nexweşiyên roviyan, jehriya xwarinê û tîfo belav dibin bi arîkariya mêş û pêşyan yê ku nexweşiyê vediguhezînin. Wîlo divê mirov hay ji paqîjiya xwarin û vexwarinê hebe, xwarin tevî ku di avsarê de be, heye ku xira bibe, nexasim bi qutbûna kehrebê re, piraniya xwarinê amedekirî li sükê û bi taybet yê vekirî nexweşiyên tinin. Pir jî xelkê hene di havînê

de vexwarinê xazî û kolayê bi piranî vedixwin, ji ber ew bawerî ku di germê de ew vexwarinê tîbûnê dişikînin û wan hewceyî avê nakin, lê rastî tersî wê ye, ji ber vexwarinê xazî asta şekir di nav xwînê de hildidin û ev dihêle mirov bêhîrtî dibibe. Ya baş di wê mijarê de ew e ku mirov ava pak vexwe, av roleke sereke di serafê xwarinê de dilîze, hem pêwîst e beramberî xwêdanê û jehrên di laş de kom dibin. Bijîşkên pispor yê xwarinê balkêşiyê didin xwarina mîweyan di havînê de, xwarina mîweyê bi tevayî jî vexwarina ava wê jî baştir e, lê divê mirov hay jê hebe ku vexwarinê qotîyan yê li bazaran têne nîşankirin ku ji mîweyan hatine çêkirin, ne dîrî vexwarinê xazî ne ji ber piraniya wan jî şekir û reng in.



PISİKA WANÊ

Pisikên Wanê Dê Bêna Jimartin

Navenda Sepandin û Lêkolînê ya Mala Pisikan a Wanê ya Zanîngeha Yuzuncuyilê diyar kir ku ji bo hejmara pisikê Wanê were tesbîtkirin, xebat destpê kirin.

Pisika Wanê nîrxekî girîng ya Wanê ye û bi taybetiyên xwe yêna balkêş tê zanîn. Pisika Wanê herî zêde bi şêrînbûna xwe, meşa xwe ya wek şêran, qimçika xwe ya ku dişibe ya roviyan, rengên çavên xwe yêna cuda û bi hezkirina xwe ya avê tê zanîn.

Cinsê pisika Wanê li ber tunebûnê ye û di salên 1990î de bi hevkarîya Walfîtiya Wanê û Zanîngeha Yuzuncuyilê ve Navenda Sepandin û Lêkolînê ya Mala Pisikan a Wanê hat avakirin û navend bi xebat û lêkolînên xwe yêna li ser pisika Wanê, cinsê pisikê diparêze.

Navend ji salên 1990î vir de xebatên girîng li ser pisika Wanê dike. Niha jî bi projeyekê dixwazin hejmar, cinsiyet û emrê pisikên Wanê nas bikin.



Tu jî li Rojava mayî..!



- Navbera jin û mêr behr e.
- Mêr ketine kewara, jin çûne hewara.
- Pîrê bawer nedikir mêr bike, dawa mal û heştekan dikir.
- Kes weke jinê bi mêrê xwe nizane.
- Jin mêra radike û jin mêra dadixe.
- Dujino bêjino.
- Mala têr jin, avê da bin.
- Şêr şêr e, çî jin çî mêr e.
- Jin stûna malê ye.
- Jin jiyane.




Kurdî Xweş e

Komele: جمعية
Sazî: مؤسسة
Komît: لجنة
Encûmen: مجلس
Deste: هيئة
Yekîne: وحدة من الوحدات
Navend: مركز
Şaristanî: حضارة
Rêxistin: منظمة

Mamik ???

- Qesra sipî, bê derf. Çi ye?
- Bi şev bûk e, bi roj pepûk e. Çi ye?

Bersiv di hejmara bê de.



Zûbêj

Tu dikarî sê caran, zû li ser hev bêjî:
(Keka, ma te ka da ga, ma ga ka xwar).

محطة مدروقات
ميديا
GAZIYA MÎDIYA
Salih Giştî
صالح كشتي
450076 قامشلي . الشارع العام . مقابل الجمارك

XAÇERÊZ

- ASOYÎ:**
- 1- Helbestevanekî kurd e.
 - 2- Zimanekî cihanî ye - Ji bo biçûkîrinê.
 - 3- Zarok jê re bû, Ez ê (di gelekjimarê de) - Tersî na (vajî).
 - 4- Pora hûnandî (vajî)- Zîlam (biçûkîrî).
 - 5- Alava rastkirina cilan- Xelas bû.
 - 6- Agir - nvr (belawela).
 - 7- Derbas bû - Wek hev - Nexweşî.
 - 8- Biçûkino (vajî).
 - 9- Xweşik (bi zaravê zarokan)- Beyreq (vajî) - Temen (bi Erebfî).
 - 10- Sîm - Ji çekên şer bû.

- STÛNÎ:**
- 1- Bajarê birca belek.
 - 2- Nas dike (vajî) - şewq.
 - 3- Wek hev- Ji dengdêran e, Nîvê /dûrtir/.
 - 4- Kehrebe.
 - 5- Serokê mirîtiyê - Rojêke heftiyê - Ayînî.
 - 6- Qerefil - Zimanê xwecihî (vajî).
 - 7- ew, ji gelekjimarê re - wek hev.
 - 8- dema çûyî (vajî)- ji rengan.
 - 9- çûne dilovaniyê (vajî) - Min (di zaravê de).
 - 10- Xwîşkê - E'yb.

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1										
2										
3										
4										
5										
6										
7										
8										
9										
10										

Hejmara Bûrî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1	k	u	r	d	i	s	t	a	n	
2	o	k		a		a	r	t	ê	f
3	b		f	r	a	v	i	n		a
4	a	x	e		z	a		a	r	d
5	n	a	r		e	r		r		i
6	ê		h	e	r		t	i	n	
7		n	e		i	n		i	a	m
8	e	y	n	e		a		k	s	i
9	c	e	g	e	r	x	w	i	n	
10		d		e	r		i	n		b